

# Di hilbijartinan de Serkeftin bo PEB

Di hilbijartinên integrationsratê ( Meclisa Hevguncîyê ) ya bajarê Bielefeldê de ( 07.02.2010 ) Êzîdîyan kursîyek bidest xistin. Eger ku meriv li ber çavan derbas bike ku ev cara yekemîn bu ku Êzîdî bi listeyek serbixwe beşdarî van hilbijartinan bun meriv dikare ji serkeftinek mezin biaxivê.

Ev serkeftin di encama yekgirtina Êzîdîyan ya ku bi hevkarîya komela Kaniya Sipi, YES e.V. û Bingeha Laliş hate bidestxistin. Van hilbijartinan dane xuyakirin ku êdî xwerêxistinî ya serbixwe bo Êzîdîyan ne peyveke xerîb e. Em di wê bahwerîyê de ne ku eger Êzîdî yekgirtina xwe xurtir bikin, ev serkeftina me dê ne bi tenê bimîne. Em bo pênc salan bo Integrationsratê hatin hilbijartin. Bo xilbeyîya beşdarîya hilbijêran em spasîya xwe tînin ziman. Namzetîya me jî jixwe bi alîkarîya wan kesan hate pêkanî. PEB bo her pêşniyarên Êzîdîyan re vekirî ye. Daxwaza PEB ew e ku bi hemu hêz û qewetê bo kiryar û daxwazên Êzîdîyan bixebitê. Ewê di raya giştî de werin gotûbêj kirin. Bi alîkarîya serokşaradarê bajarê Bielefeld birêz Pit Clausen û Karl-Heinz Voßhans ( Serokê daîreya hevguncîyê ya bajarê Bielefeldê ) emê hewl bidin ku pirsgerêkan çareser bikin. Ji hemu rayadarên siyasî û fraqsiyonên şaredarîya Bielefeldê jî em hêvîya piştgirîyê dikin.

PEB wê hewl bide ku civaka Êzîdî li bajarê Bielefeldê bi wêneyek pozîtîf werê naskirin. Aştîxwazî û toleransa wan li hember kesên din jî wê bide xuyakirin.

Li ser navê PEB emê hewl bidin ku bo hemû Êzîdîyên ku li bajarê Bielefeld bicih bune bixebitin. Hêvîya PEB ewe ku hevkarîyek baş bi gelê xwe yê Êzîdî re bimeşîne.

Em spasîya hemî hilbijêran bo piştgirîya wan dikin û bo kesê hilbijartî jî serkeftinê di karî wî di Meclisa Hevguncîyê de dixwazin.

Eger pirsgerêk, daxwaz anjî pêşniyarên we hebin hun dikarin bi rîya telefona jêrîn de bi me re peywendîyê çêkin: 0173- 57 59 315 / an jî bi rîya e.Mail ê: [vezdan@online.de](mailto:vezdan@online.de)

Plattform Bielefeldî yê Êzîdî

Kaniya Sipi e.V. / YES e.V. / Bingeha Laliş e.V

Bielefeld, 09.02.2010